**Agahdarî derbarê tewsiyekerê te**

________________________________
Navê tewsiyekerî:

________________________________
Cihê karî:

________________________________
Nimreya telefonê:

________________________________
Navê îlacgirî:

________________________________
Îmze

**Agahdarî derbarê Navenda alavên alîkar**
Xizmeta miracaetkaran
tel. 0455 – 73 63 35
e-poste: hjalpmedelscenter@ltblekinge.se

Navnîşana serdanê: Skrädderivägen
371 55 Karlskrona

Serrastkirin 2016-04-22

LANDSTINGET BLEKINGE

# Tiştên ku pêwîst in tu derbarê alava xwe ya alîkar bizanî

**Berpirsiyarîya te**
Divê alavên alîkar li gor agahdarî yên ku di rêbernameya alîkarîyê de hene û li gor agahdarî yên ku tewsiyekerê te dide te bên bi kar anîn.

Çavdêrîkirin, paqijkirin û sexbêrîkirin ji bo her alaveka alîkar gerek e.

Tu yan nasê te yan sexbêrkarê te di dema deynkirina alava alîkar de ji wê alavê berpirsiyar in. Meclîsa wîlayetê ya Blekingeyê xwedîya alavên alîkar e. Çênabe ku alavên alîkar bên firotin yan bi deyn bên dan.

Heger alava alîkar bi awayekê nenormal têk biçe, ziyan pê bikeve, winda bibe yan bê dizîn, bedelkirina wê berpirsiyarîya te ye. Lewra giring e ku tu binêrî ka heqê tezmînatê yê te çi ye.

Di dema teslîmkirina alava alîkar de, desteyeka rêbernameyan li gel heye. Lewra wergirê lênêrînê bi xwe mesrefa van tiştan dide:

- Baterî (A, AA, AAA, 9-volt û baterî ji bo saetê)
- Parçeyên yedek û maskên CPAPê
- Sêlikên elektrod ji bo TENSê

Meclîsa wîlayetê yan belediye heqê temîrkirina ziyanan yên ku ji ber bikaranîna alava alîkar di derdora te de, bo nimûne li mala te, peyda bûne nade

**Zerar yan xesar**
Dema alava te ya alîkar xerab bibe, winda bibe, bê dizîn, tiştek pê bê yan lê biqewime, têkilîyê bi tewsiyekerê xwe re dane. Dema alav bê dizîn, polîsî û şîrketa xwe ya temînê agahdar bike.

**Xizmet û temîrkirin**
Xizmet û temîrkirn di halê têkçûna adetî ya alavê de ji te re belaş in. Pêştir têkilîyê bi tewsiyekerê xwe re dane.

Tu dikarî têkilîyê bi Xizmeta teknîkî ya Navenda alavên alîkar re jî danî.
demên telefonkirinê duşem-înî 8.00 - 9.00, 13-00 - 14.00. Di demên din de, îmkan heye ku tu bi rêya bersivdara telefonê peyamekê bidî.
tel. 0455 – 73 63 35 e-poste: tekniskservice.hmc@ltblekinge.se

**Barkirin**
Dema tu cihê xwe di nava wîlayetê de diguhorî yan bar dikî û diçî derveyî wîlayetê, divê tu pêşwext berî barkirinê têkilîyê bi tewsiyekerê xwe danî. Dema tu bar bikî û diçî derveyî wîlayetê, adeten divê tu alavên alîkar vegerînî. Tu dikarî alaveka alîkar ya nû li cihê akincîbûnê yê nû werbigirî. Heger tu alavên alîkar bi xwe re bibî bêy ku te peywendî kiribe, tu ji vegerandina alavên alîkar ji bo Meclîsa wîlayeta Blekingeyê berpirsiyar î.

**Vegerandin**

LANDSTINGET BLEKINGE

Gava hewceyî bi alavên alîkar nemîne, divê ew pak û paqij bên vegerandin. Heger tu - tevî xwastina tewsiyekerî - alavên alîkar venegerînî, tu dê mecbûr bibî bedelê bidî. Têkilîyê bi tewsiyekerê xwe yan Navenda alavên alîkar re dane,
tel. 0455- 73 63 35